
Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1088 | 6-Tebax- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Gelo li dinyayên super jiyaneke din pêkan e?

**Em çi qasî bibêjin erdê wê gerestêrê ji bo jîngehê baş e, ev yek ne diyar e mirovên dinyayê bikaribin li wir bijîn yan na. Ji bo jiyanê erdeke wisa li me pêwist e divê em bikaribin pêş da herin.**

Peyka (stalayt) TESSê ya NASAyê ya projeya ji bo lêgerîna gerstêran di sala 2018an de bi roketa Falcon 9a SpaceXê şandine fezayê. TESS ezmanan kontrol dike, wan ronahiyên ji stêrkan tê dipîve û derbasiyên gerestêrên li derveyî zeft dike. Em rasterast nikarin gerestêrên li derveyî bibînin û li ser wan biaxivin. Gava peyk ji ber ku li ber dora gerestêrên li derveyî diçe û piştî ji ber dora stêrkan derbas dibe, ronahiya stêrkan kêm diçe dinyayê. Bi vê yekê jî em dikarin li



ser hebûna gerestêrên li derveyî biaxivin. Bêguman piştî xebata bi peykê bi teleskobên mezin xebatên bihûrgilî dikin. Wekî nihêrîna li giranî, mezinahî û tîrbûna wan.

Projeya TESSê lêgerîna jiyaneke din ji xwe re dixe armanc. Ji bo vê yekê jî li stêrk û gerestêran digere. Heta vê rojê beriya TESSê 2 hezar 650 heb gerestêr hatine dîtin lê belê wisa fikir dikin ku Peyka TESSê ji Teleskoba Keplerî yê baştir bixebite. Her wiha lêkolînerê sereke ya TESSê, "Ji gerestêrên Teleskoba Keplerî dîtine yê du qatan jê pirtir gerstêran bibîne". Lê heke hûn bipirsin cudahiya xebata peyka TESSê û Teleskoba Keplerî çi ye, firehiya xebata wan e. Teleskoba Keplerî yekalî dixebitî û temaşeyî 150 hezar 000an stêrkan dikir. Lê belê dema teleskobê xelas bûbû. Ya peyka TESSê jî xebateke berfirehtir yanê li ser ji sedî 85a ezmanan bû. Bi vî awayî dikaribû zêdetir stêrkên li nêzîkî bibîne. Teleskoba Keplerî li dora Tavê digeriya lê peyka TESSê li dora gerstêra me digere. TESS ê ji 108 hezar 000 kîlometreyan heta 373 hezar 000 kîlometreyan bigere û stêr û gerestêran peyda bike.

Di van rojên dawî de NASAyê dîtina du gerestêkên nû yên "Super- Dinya" ya li dora stêrkek tîp M a dereng dizivirin, ragihandine. Cîhanên biyanî yên nû hatine dîtin, bi navê LP 890-9 b û LP 890-9 c, hinekî ji dinyayê mezintir in. "Super-Dinya" gerstêrkên ji dinyayê mezintir in, lê ne ji girseya Neptûnê ne. Her çend peyva "Super- Dinya" tenê ji girseya gerstêrê re bibêjin, ew ji hêla stêrnasan ve jî tê bikaranîn da ku gerstêrkên ji dinyayê mezintir lê ji "Neptunên Biçûk" biçûk jî bi nav bikin.

LP 890-9 b bi qasî 1,32 nîvçapa dinyayê ye û girseya wê ji 13,2 girseyên dinyayê ne mezintir e. Germahiya hevsengiya LP 890-9 b jî wekî 396 K hatiye hesibandin. Dema dor tê ser LP 890-9 c, nîvçapa wê bi qasî 1,37 nîvçapên dinyayê hat pîvandin, dema ku girseya wê ji 25,3 girseyên erdê kêmtir e. Gerstêra li derveyî bi 0,04 AUê ji stêrka xwe tê veqetandin û heyama wê ya gerestêrê bi qasî 8,46 rojan e. Germahiya hevsengiya gerstêrkê jî di asta 272 K tê texmînkirin.

Bi van encamên lêkolînê stêrnasan destnîşan kirin dîtina wan LP 890-9an dibe ku stêrka duyemîn a herî sar a piştî TRAPPIST-1-ê bê dîtin. Li gorî diyarkirina wan gerstêrka erdê wê herêma jîngehê ya herî xweş a duduyan e, heta niha hatiye dîtin.

Bêguman em çi qasî bibêjin erdê wê gerestêrê ji bo jîngehê baş e, ev yek ne diyar e mirovên dinyayê bikaribin li wir bijîn yan na. Ji bo jiyanê erdeke wisa li me pêwist e divê em bikaribin lê hemî hewcedariyên xwe pêk bînin û bi pêş da herin. Germahî, pesto û rewşa erda wê derê ji bo jiyaneke nû gelekî grîng in. Belkî em bikaribin gerstêreke li gorî jiyanê bibînin lê belê ev yek ne diyar e, em ê hînî wê derê bibin, bikaribin li wir bijîn yan na…

# Zûgotinok çi ye?

Di nav kurdan da edebîyata kurdî ya devkî gelekî pêşda çû ye. Dewlemendiya edebiyata devkî ya kurdan xweşiyeke gelekî balkêş dide zimanê kurdî. Di vê nivîsê da ez dixwezim behsa zûgotinên kurdî bikim. Zûgotin beşeke ji edebîyata kurdî ya devkî ye. Zûgotin bi lihevanîna peyvên biqafîye û biaheng hatine çêkirin. Di bingeha zûgotinan da carinan meselokên biwate carinan jî ên bêwatê têne vegotin. Jixwe pir caran peyvên di nav zûgotinan da jî bê wate ne. Hinek zûgotin hene bê dawî ne. Lê tu li hinekan jî dinêrî dawiya wan wekî hevdu diqede. Hinek kin hinek dirêjin. Jixwe zûgotin wek helbestên kurdan ên kevintirin tên qebûl kirin. Lê di rastiya xwe da ne helbest in. Dema ko em bi nêrîneke fireh, li zimanê kurdî binêrin, em ê dewlemendiya zûgotinên kurdî fehm bikin. Vegotina min eve ku; bi saya zûgotinên kurdî em dikarin li




zimanê xwe xwedî derkevin. Bi rê û rêçika zûgotinan em dikarin fêrî zimanê xwe bibin û hînkirina zimanê kurdî ber bi pêş de bibin.

Bi dubarekirina zûgotinan em dikanin zimanê dayikê bi zarokên xwe hezkirin bidin. Bi rastî jî min ceribandiye; dema ku zarok fêrî zûgotinan dibin, gelekî jê hez dikin, cardin, cardin û cardin dubare dikin. Pir caran jî di lîstikên xwe de bikar tînin. Ji xwe zûgotin ji bo mezinan jî pir caran dibin sedema xweş wext derbaskirinê. Di vê qûncenivîsê de ez dixwezim ji we re du heb zûgotinên balkêş binivîsim.

Ji kerema xwe van zûgotina bixwînin. Eger ku hû dikanin ji ber bikin. Û hînî zarok, xwişk û birayên xwe bikin. Ji we hemûyan re dem xweş…

**Quling**

Quling quling rêzo, A paşin tew rêzo, Meta min e Zînê, Kêrê hildikşînê, Kêra ser bi zengil e, Kuta serê dilê, Xwîn firiya Musil e, Musil bavê şêr e, Herban da bi nêr e, Herba ser şikestî, Herîr pêda bestî, Herîro xaso, Pê dirû keraso, Kerasê kê ye, Ê Fatma Nebiya ne, Çekire ser ciya ne, Diza dizî, Dizo beri bi ku da, Bi Helebê da, Ji Şamê wê da, Şam ji ber çû, Keko ji ser çû, Keko tu bi xwe kî, Tu bi xwedê kî, Çengek zirav têkî, Ziravo, Geniyo, Çûçik pê keniyo, Çûçik marê reş bû, Xwişiya qula xwe…

Sudoku: Bersiv 97

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 3 | 6 | 2 | 8 | 1 | 7 | 5 | 9 | 4 |
| 1 | 9 | 8 | 4 | 6 | 5 | 7 | 2 | 3 |
| 4 | 7 | 5 | 9 | 3 | 2 | 8 | 1 | 6 |
| 2 | 8 | 4 | 1 | 5 | 9 | 3 | 6 | 7 |
| 7 | 5 | 6 | 2 | 8 | 3 | 1 | 4 | 9 |
| 9 | 3 | 1 | 7 | 4 | 6 | 2 | 5 | 8 |
| 6 | 4 | 7 | 3 | 2 | 1 | 9 | 8 | 5 |
| 8 | 1 | 3 | 5 | 9 | 4 | 6 | 7 | 2 |
| 5 | 2 | 9 | 6 | 7 | 8 | 4 | 3 | 1 |

Sudoku:Pirs 98

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 1 | | 9 | | | | 4 |
| | 9 | | 1 | | 6 | | 7 | |
| | 6 | 5 | | | | | 2 | 1 |
| | | | 8 | | | 3 | 4 | 6 |
| | | | | 1 | | | | |
| 8 | 3 | 7 | | | 9 | | | |
| 3 | 5 | | | | | 4 | 9 | |
| | 4 | | 7 | | 2 | | 1 | |
| 1 | | | | 3 | | 2 | | |

# FERHENGA BIWÊJAN

**Miqewrê (kundirê avjeniyê) derîvenekirî ye, çiqas tu avê pê de bikî binav nabe:**

- Ji ya xwe nayê xwarê; serhişk e; tişt bi serê wî nakevin.

Natewe/naçeme:
- Ji ya xwe nayê xwarê; guhê xwe nade ti kesî.

Nayê ber nîr:
- Ji kar direve; ji ya xwe nayê xwarê; qebûl nake; tişta ku jê tê xwestin nake.

Ne ker tê ber bar, ne bar diçe ber kerê:
- Karekî pir zehmet e; her du jî ji ya xwe nayên xwarê.

Ne li pirê tê ne li bezê:
(Ne di ser pirê re tê, ne di ser avê re xwe diqevêze)
- Pir rikoyî ye; miqerisiyan dike; tiştekî qebûl nake; ne wisa qebûl dike ne wisa.

Ne serikê xwe datîne ne repikê xwe:
- Ji ya xwe nayê xwarê.

Peyv di serê wî de naçin/gotin di serê wî de naçin:
- Serê wî hişk e; gotin bi serê wî nakevin.

Rika xwe bide dîk wê hêkê jê derîne:
- Pir rikoyî ye; rika xwe bide yekî heta tişta dixwaze bi dest nexe nasekine; cira wî pir ne xweş e; bi mirov ve dibe bez û benîşt.

Rika xwe bide mirîşkê wê hêkê ji qûnê derîne:
- Pir rikoyî ye; rûyê wî qayîm e.

Serî û sê pepik in:
- Pir rikoyî ye; ji ya xwe nayê xwarê; pir li ber xwe dide; teslîm nabe. (1)

Tu çiqas pisîkê hilvêjî wê li ser lingê xw bisekine:
- Miqerisiyan dike; ji ya xwe nayê xwarê; mirovekî serhişk e.

Xwe diavêje erdê:
- Ti tiştî qebûl nake.

Xwe avêt çalê/xwe diavêje çalê:
- Ti tiştî qebûl nake; serhişk e.

Xwe nade bar nîr:
- Bi heman wateyê.

Yek bû lat yek bû zinar:
- Her du ji hev rikoyîtir in.

Yeka xwe nekir dido:
- Ji ya xwe nehat xwarê; miqerisî kir.

LI SER BÎNTENGBÛN Û HÊRSBÛNÊ

Anî gewriya min:
- Ez tijî bûm; ez hêrs bûm; ez pir xeyidîm; êdî nehat xwarin.
*Destpêkê min pir sebir kir, lêbelê anî qirika min.

Anî qirika min
- Bi heman wateyê.

Bayê cinan lê xistiye:
- Pir hêrs bûye.

Berê xwe dayê:
- Lê hêrs bû; pê re xeyidî.

Bêhna min hat serê pozê min:
- Êdî sebra min nema; ez pir hêrs bûm.



# Şopa Şehîd Îsa Hiso hîn jî zindî ye

Şehîd Îsa Hiso yek ji pêşengên Rojavayê kurdisatnê ye ku ji bo gel û civaka xwe tekoşîneke bêhempa kir. Hevalên şehîd Îsa Hiso ew bi bîr anîn û soza şopandina riya wî, dan. **R-6**


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1088 | 6-Tebax- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# BERXWEDANA GELAN WÊ PLANÊN DAGIRKERAN TÊK BIBIN

Êrîşên dewleta Tirk a dagirker û mêtînger ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê roj bi roj didomin. Gund û bajarên me bê ser û ber tên topbaran kirin, bi vî rengî hewl didin aramiya herêmê têk bibin. Ji ber ku hêzên navneteweyî li hemberî êrîşan bêdeng in, dewleta Tirk a dagirker ji vê bêdengiyê sûd werdigre û êrîşên xwe zêde dike. Dewleta Tirk a dagirker bi van êrişan dixwaze tola DAIŞ'ê ya ku li Şengal û Rojava têk çûye, hilîne. **R-3**



## Xwendin Zanîn e Zanîn Hebûn e



Bi armanca pêşxistina çanda xwendinê, Bexçeyê Xwendinê di sala 2019'an de li bajarê Qamişlo hat vekirin. Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê Ebûd Mexso diyar kir ku bi vekirina Bexçeyê Xwendinê çanda xwendinê pêş ket.**R-7**

## Kiryar û êrîşên dagirkeriyê li ser gelê Efrînê



Dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê li kêleka kiryarên dijmirovî yên ku li Efrînê pêk tînin, êrîşên xwe li ser herêma Şehbayê zêde dikin û bi her awayî sivîlan dike armanc.**R-3**

**Mirov ji rûmetê kêmpar bibe jî, evqas bêpar nabe!**
Zozan Cizîrî *R-2*

## Komkujî û planên dagirkeran nikarin vîna gelan bişkînin



Leyla Ibrahîm Mehmo hevseroka Mala Êzîdiyan a Cizîrê û Welat Zerdeştî komisiyonê perwerda, girêdayî komkujiya 3'ê Tebaxê 2014'an a ku li ser Êzidiyên Şengalê ya ku bi destê çeteyên DAIş'ê hatî meşandin gotin:Ku komkujiya 3'ê Tebaxê şerma mirovahiyê û saziyên mafê mirovan e. Herweha şervnê YPJ- YPG û HPG û YJA-STAR jî yên ku gelê Şengalê rizgarkirine ew parêzvanê mirovahiyê ne.**R-5**

## 'Êrîşên dagirkeriyê dewamiya hişmendiya dijmin a sedsalî ye'

Êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê û Qadên Berxwedanê bênavber dewam dikin. Endamê Desteya Rêveber a MSD'ê Ezher Ehmed da zanîn ku êrîşên dagirkeriya Tirk dewama hişmendî û planên qirkikrina gelê Kurd a Peymana Lozanê ye.**R-4**



# Wêje parçeyek ji têkoşîna jinan e

Nivîskara Mexribî Laila El- Sahfeî ya derbarê jin û wêjeyê de axivî û bal kişand ku ji bo têkoşîna azadiya jinan nivîsandina wan girîng e û got jin bi têkoşîna xwe ya di vê qadê de dikarin pirsgirêkan çareser bikin.

Li Mexribê di warê nivîskariya jinan de pêşketinek berbiçav çêbûye. Nivîskarên jin hemû mijarên girêdayî jinan dinivîsînin bi hesasiyetek zêde êşên jinan vedibêjin loma her ku diçe berhemên wan zêde dibin.
Laila El-Shafeî ya destnîşan kir ku nivîsandina jinan serkeftinek e di mijarên jinan û çareseriya pirsgirêkên wan de pêk aniye, got ku taybetmendiyên nivîsandinê yekem karekî takekesî ye duyem jî guhertina rewşa heyî armanc digre.

**Afrîneriya jinan çawa dozên wan çareser dike û bi ser dixe?**

Di qada çandî de nakokiyên der barê têgeha afrîneriya femînîstî bi giştî heye. Bi taybetî nivîsandina jinan. Bi nêrîna gelek nivîskar û afrînerên jin ên ku red dikin berhemên xwe di bin navê afrîneriya jinan de dibînin ku afrîneriya baş heye û ya nebaş heye. Naxwazin bi awayekî cihêkar li afrîneriya wan bê mêzekirin di nava biryarên nirxandina giştî ya jinan de.
Hinek jî dibînin ku ew girîngiyek e ji ber rewşa jinan a ku nayê guhertin û her dem hatiye paşguhxistin rastî tundiyê tê derdibirîne. Taybetmendiya jinan a biyolojîk jî weke afrînerên jiyanê afrîneriya jinan cuda dike û hesasiyeteke wê ya zêde heye ji ber ku taybetmendiya jinan di herdu aliyên pêş de ku me diyar kir vedibêje. Bêyî ku cudahiyê bixe nava nivîsên jinan û yên mêran pîvan tenê berhemê baş in, çi mêr dibe çi jin dibe.
Ez weke nivîskarek di Yekitiya Nivîskarên Mexribê de têkoşiyam ji bo ku jin bigihîjin navendên biryardayînê. Ji bo hevserokatiya yekitiyê di kongreya 18'emîn de hatim hilbijartin dengên min bi dest xistin ji ya du nivîskarên xwe ji bo serokatiyê hilbijartibûn derbas kirin. Bi saya min kotaya jinan bi rêjeya ji %30 ji bo nivîskarên jin di ofîsa cihbicihkar de di zagona bingehîn a yekitiyê de hat pejirandin.

**'Nîvîsandin li ser doza jin bandora xwe dike'**

Dûrî helwesta afrîneriya jinan ji vê têgehê, ez dibînim nivîsandina jinan heta asteke baş dozên jinan çareser kirine û bi ser ketine. Nivîskar Khanata Bannouna ya ku bi tundî red dike nivîsên wê di beşa jinan de bin, di hemû nivîsên wê de jin serkeftî ne û piraniya lehengên wê jin in.

Ez dixwazim destnîşan bikim ku nivîsandina jinan bi awayekî zêde li Mexribê bi pêş ketiye, ji dawiya salên 1960'î ve heta îro hejmara wan gelekî zêde bûye û pirtûkên wan di hemû beşên wêjeyî de zêde û balkêş bûne.
Ezê tenê lêkolîneke bîbliyografîk ku ji aliyê rexnegirekî Mexribî ve di warê çîroka jinan de bi Erebî hatiye nivîsandin û li ser pêşketina nivîskariya çîroka jinan li Mexribê heta sala 2011'an hatiye kirin binirxînim. Tê de hatiye gotin ku di salên hezarsala duyem de 81 kom çîrok hatine weşandin lê belê di hemû salên 1960-1970-1980-1990 bi hev re 31 komên çîrokên jinan derketine û sala herî berhemdar a 2006'an de 15 komçîrok bûn.

**Yekem romana jin a Mexribê: Şahinşah Khounata**

Li gorî bîlançoya sala 1967'an yekem komçîroka jinan li Mexribê bi navê "Bila bêdengî bikeve" ya nivîskara jin Khanata Bannouna bû lê yekem komçîroka mêran bi navê "Çarenûsa Qederan" a nivîskar Mustafa Al- Gharabawî bû di sala 1938'an de, ev tê wateya ku jin piştî 30 salî tevli karên nivîsandinê bûne ji ber gelek sedeman ku di serî de ji ber dereng dest bi xwendinê kirine.
Yekem romana jinan li Mexribê bi navê "Şahinşah Khounata" bû di sala 1954'an de derket lê yekem koma helbestên jinan di sala 1975'an de derket ew jî gelekî pêşketîtir bû yekem deqa şanogeriya jinan e ku di sala 2005'an de derket bi dîroka derketina yekem koma çîrokan li Cezayîrê ew jî "Resîfê Xewkirî" ku ji aliyê Zouhour Wanissi ve hatibû nivîsandin. Li Tûnisê yekem komçîrok bi navê "Me jiyanê xwest" a, Najia Tamer bû. Di sala 1956'an de derket û li Lîbyayê jî komçîroka "Çîrokên Neteweyî" ya Zaima Al-Baroni bû di sala 1958'an de derket. Bi kurtî, nivîsariya jinan bi giştî pêşketinek balkêş pêk aniye, piraniya nivîskarên jin mijarên jinan dinivîsînin û êşên jinan derdibirînin berhemên wan jî zêde bûne.

**wêjeya giştî bi çi rengî pirsgirêkên civakî û jinan digrin dest**

Rast e helbest û wêje û hemû cureyên afrîneriyê yên din weke şano, sînema, hunerên ciwan û muzîkê zêdetir xwedî rolên girîng in, êşên jinan derbirînin, pira-



niya nivîskar û afrînerên jin bi giştî li ser êşên jinan dinivîsînin û hin nivîskarên mêr jî li ser jinan nivîsandine.
Nivîsandin û afrînerî xwedî taybetmendiyek cuda ne ku ya yekem karekî takekesî ye û ya duyem hewl dide guhertinan pêk bîne, rewşa heyî teqez bike. Lê nivîskar ne xwedî biryarên siyasî ne, dikarin tenê hişmendiyê biguherînin. Civaka Mexribê di asta nirxandinan de gelekî paşketî ye li gor salên 1980'yî ku du alî di nava civakê de hebûn, yek pêşketî bû hewldana guhertinê dikirin û ya duyem parêzer bû hewl dida ber bi paş ve vegerin mafên jinan û kêm pêkhateyan nedidîtin di encama mayîna partiyên Îslamî bi navê "Dadwerî û Pêşveçûn" hebû. Wê demê ev partî desthilat bû û fikrên xwe nava civaka sivîl û hemû civakê de belav dikirin, bi taybetî li taxên kenarên bajaran. Wisa civak di salên 1960-1970-1980-1990'an de vekirî bû. Piraniya civakê mafên jinan û wekheviya di navbera herdu zayendan de weke nirxê pêşketina civakê bawer nake lê civaka sivîl û tevgera jinan kar kirin û xwestin zagona rewşa kesane bê guhertin ji ber ku di warê mafên jinan de ne dadwer bûn.

**Doza jinan di nava civakê û rêbazên çareseriyê**

Tevgera femînîst karekî xurt ji bo guhertina zagona malbatê dike, bi taybetî piştî lêkolînan îsbat kir ku di hinek cihan de kêmasî hene. Weke zewaca di temenê biçûk de li şûna ku bê kêmkirin niha duqat zêde bûye. Li gel guhertina zagonên din ên li ser mafên jinan. Hin rêxistinên navdewletî piştgiriya desteyên civaka sivîl ên piştgiriya jinan dikin nakin. Lê ez bawer dikim ku divê vîneke siyasî ji bo pêkanîna guhertinê hebe divê tevgera jinan hişmendiyên paşverû biguherîne ji ber ku guhertina zagonan hêsan e lê guhertina hişmendiyê ked û demek dirêj pêwîst dike. Destkeftiyên jinan piştî tevgera 20'ê Sibatê dest pê kirine di çarçoveya Bihara Ereban de di sala 2011'an de gef lê tê xwarin ku winda bibin ji ber ku vîneke siyasî ji bo guhertinê tune ye.

**Peywendiya wêjevan û helbestvanan bi helbestvan û nivîskarên jin re**

Hevbendiya nivîskarên jin ên Mexribê di sala 2012'an de hat damezrandin, piştre ez li ser mijara têkiliyên bi nivîskarên jin ên din re xebitîm. Ev di ragihandina hevbendiyê ya xelata salane ya ji bo afrîneriya helbest, kurteçîrok, roman, şanoyê de bi navê "Xelata Nivîskara Jin a Mexribî" diyar dibe. Hevbendî hewl dide di pêşerojê de berfirehtir bibe ku li ser asta gelek dewletan be.
Ev hevbendî bi pêşengiya desteyên fermî yên dewletên Cezayîr, Tûnis, Mûrîtanya û Lîbyayê ket pratîkê, Yekitiya Nivîskarên Mexribê yên Jin hat ragihandin. Hevbendiyê di Adara borî de hevbendiya nivîskarên Afrîqayê damezrand ku li pirtûkxaneya niştimanî ya Ribat hat lidarxistin. 130 nivîskarên jin ji 40 dewletên Afrîqayê amade bûn. Bi serokatiya seroka hevbendiya nivîskarên jin ên Mexribî Badia al-Radî bû, hevbendiyê biryar da ku her roja 9'ê Adarê nivîskareke Mexribî xelat bikin ji ber pêşketina wan.
Kongreya damezrînerî ya hevbendiya nivîskarên jin ên Afrîqayê derfeteke baş peyda kir ji bo çanda afrînerî bi zimanê me be li ser bingeha wekheviyê di hemû waran de û bibe pira navbera hemû çandên Afrîqayê û afrînerên jin di xizmeta azadiya fikir û afrîneriyê de bin.

**Jin li herêmên ku pevçûn û şer li wan hene zêdetir êş û zehmetiyan dikşînin.**

Wêje û nivîsarî karekî takekesî ye, li gorî daxwaz û nêrînên nivîskaran e, tu nikarî li ser nivîskarekî zorî bikî bibêjî li ser vê mijarekê binivîsîne. Lê min hin roman xwendine der barê êşên jinan di demên şeran de bû zordariya li ser wan weke jin çawa duqatî ye weke destdirêjî, koletî û kuştin. Weke romana "Jiyan bê min" a nivîskar Aisha Al-Basrî êşên jinan dema şerê Vîetnamê vedibêje û gelek romanên din weke vê hene. Min ne derbarê jinên Êzidî û bûyerên têkildarî çeteyên terorîst de ne jî der barê jinên Sûriyeyê de tiştek nexwendine lê ez bawer dikim ku li wê derê di warê wêjeyê de li ser vê mijarê gelek tişt hatine nivîsandin, êşên xwe bi zimanê Kurdî û Erebî nivîsandine.

## Ramangeh

**Mirov ji rûmetê kêmpar bibe jî, evqas bêpar nabe!**

Zozan CIZÎRÎ

Wekî gelê Kurd em kêliyên azadiyê dijîn van rojên di bin êrîşên giran ên zordar û dagirkeran de. Elbet di dîroka mirovahiyê de tu gelekî bi hêsanî serxwebûn û azadî bi dest nexistiye. Hemû di berdêla ked, berxwedanî û malwêraniyên mezin de pêk hatine. Em gelê Kurd jî, îro di qonaxek wiha re derbas dibin. Heqîqeteke din jî heye ku, di her şoreşekê de bi qasî berxwedêr û cengawerên welat xayîn-xwefiroş jî derdikevin, bi qasî welatperwer û çavnetirsan tirsonek û revok jî derdikevin. Îcar em jî yek ji wan demên watedar ên têkoşîna azadiyê dijîn. Bi taybetî van rojên ku hemû gelê Kurd tevî siyasetmedar, rewşenbîr û zane-şarezayên xwe li hemberî sed saliya Lozanê ya welatê me kirî çar parçe û dayî dagirkirin dibin xwedî helwest, naxwazin sed salên pêş me jî cardin di bin dagirkerî û zilmê de derbas bikin; tenê binemala Barzanî ya xwefiroş-xayîn di eniya dijmin de cih digire ku ev cihê şermezariyê ye. Dunya alem dizane gerîlayên azadiya Kurdistanê tev keç û xortên gelê Kurd -li gel sedan keç û xortên enternasyonal ên Ereb, Tirk, Alman, Îngilîz û hwd.- ên herî azadîxwaz û pêşengên welat in. Hebûna gerîla li çiyayên Kurdistanê di kesayeta gelê Kurd de rûmeta mirovahiyê diparêze. Di vê wateyê de jiyan û têkoşîna her gerîlayekî/ê destanek e, nirxeke civakî ye.
Tê zanîn hêza gerîla ji destpêka sala 2018'ê ve ango bi êrîşa li ser bajarê Efrînê û heya niha li hemberî hemû êrîşên dagirkeriyê yên dewleta Tirk a faşîst têkoşîneke bênavber û serkeftî dimeşîne. Bi taybetî sekin û şerkeriya hêza YJA-Star hemû qalibên cinsperest ên kapîtalîst hildiweşîne û rûmeta tevahî jinan diparêze. Li hemberî vê rastiya serbilind, îro dîsa hêzên xayîn-xwefiroş ên binemala Barzanî xwe digihînin hawara hêzên dijmin ên di Zap û Metîna de li hemberî vê têkoşîna gerîlayên Kurdistanê xitimîne.
Ew gerîla ku li hemberî êrîşên dagirkeriyê bi taybetî li herêmên Zap, Metîna û Avaşînê di eniya herî pêş de tam du sal in xwarinek rihet nexwarine, şevek bêxew-rojek bêtopbaran û kîmyabaran derbas nekirine, ku dilê hemû gelê Kurd û xelkên azadîxwaz li ser wana ye. Binemala Barzanî ku axa Başûrê Kurdistanê ya bi xwîn û xwêdana hezaran qurbanî, ked û berxwedana xelkê me yê Başûr hatî rizgarkirin, kiriye meydana cenga dewleta Tirk a dagirker! Ev rewşa mala Barzanî, demxeyek reş e di dîroka me gelê Kurd de. Her kes baş dizane ku zorî û zehmetî çi dibe bila bibe, di encamê de wê têkoşîna gerîla ser bikeve. Lê gelo mala Barzanî difikire ku di rojên azadiyê de wê zarokên wana ji şerma nekaribin navê Barzanî jî li xwe bikin û bînin ziman? Wê çaxê wê bi çi rûyî derkevin pêşberî Kurdan? Her sê seriyên Barzanî (Mesût-Mesrûr-Nêçîrvan Barzanî), erê bi qedera gelê Kurd nafikirin, lê maqey bi qedera zarokên xwe jî nafikirin?
Hêja ye em bibêjin; mirov ji rûmetê kêmpar bibe jî, evqas bêpar nabe!



# Xwendin Zanîn e Zanîn Hebûn e

Bi armanca pêşxistina çanda xwendinê, Bexçeyê Xwendinê di sala 2019'an de li bajarê Qamişlo hat vekirin. Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê Ebûd Mexso diyar kir ku bi vekirina Bexçeyê Xwendinê çanda xwendinê pêş ket.

Ronaz Silêman/Qamişlo

Piştî lidarketina Şoreşa 19'ê Tîrmehê, gelên Rojava di tevahiya milan de, destkeftî bi dest xistin. Yek ji van destkeftiyan jî, pêşxistina çanda xwendinê li cem gel, bi vê armancê Yekîtiya Rewşenbîrîn Herêma Cizîrê di sala 2019'an, Bexçeyê Xwendinê li bajarê Qamişlo vekir. Di Bexçeyê Xwendinê de çalakiyên çandî yên cûr bi cûr tên lidarxistin, herwiha ev bexçe ji bo hezkerên xwendina pirtûkan bû derfetek.
Derbarê avakirin û armanca vekirina Bexçeyê xwendinê, hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê Ebûd Mexso ji rojnameya me re axivî.

**'Sala 2019`an de bexçeyê xwendinê hat vekirin'**

Ebûd Meqsû diyar kir ku di sala 2017`an de, ji bo avakirina pirojeyê bexçeyê xwendinê amedekarî dihat kirin û wiha got: "Desteyên Rêveber û Yekîtiya Rewşenbîrên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, biryara avakirina bexçeyê Xwendinê bi Rêveberiya xweser û Şaredariya



bajarê Qamişlo re giftogo kirin, herwiha ji aliyê Rêveberiya Xweser ve erêkirin li ser vê pilanê hat kirin. Ji sala 2019`an de bexçeyê xwendinê hat vekirin. "

**'Bexçeyê Xwendinê bexçeyê hemû gelan e'**

Hevserokê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê Ebûd Meqsû bi vî rengî behsa Bexçeyê xwendinê kir: "Di hundirê bexçeyê xwendinê de Nivîsgeheke Pirtûkan heye. Mîna pirtûkxaneyekê ye, pirtûkên renge reng bi zimanê kurdî, erebî û tirkî tê de hene. Herwiha holeke çalakiyan jî di Sibata 2020`an de ji bo giştî çalakiyan di hundirê bexçeyê xwendinê de hat vekirin. Asta xwendinê di salên destpêkê de kêmbû, lê sal bi sal asta çûn û hatina bexçeyê xwendinê ji aliyê gel, nivîskar û rewşenbîran pêş ket. Bexçeyê xwendinê, bexçeyê hemû gel û rewşenbîra ne, bi armanca pêşxistina xwendinê hatiye avakirin."

**'Bi xwendinê çanda mirovan pêş dikeve'**

Mexso diyar kir ku armanc ji vê pirojeyê kombûna rewşenbîr û nivîskaran Rojavayê kurdistanê li bajarê Qamişlo ye û wiha domand:




"Bexçeyê Xwendinê danûstendina di navbera nivîskaran de, herwiha di navbera hemû beşên civakê pêş dixe. Çalakiyên di bexçeyê xwendinê tên lidarxistin, nivîskar, rewşenbîr û mêvanên ji derveyî Qamişlo jî, berê xwe beşdar dibin. Di bexçe de çar peyker hene; peykerê Seydayê Cegerxwîn, Osman Sebrî, Şêrgo Bêkes û Apê Mûsayê Enter re, bexçe ji bo hemû kesî û saziya ne. Bi taybet niha ciwan pir berê xwe didin bexçe, ji bo pêşxistina xwendin û çanda xwe, ev gaveke başe. "

**' Em hewl didin ku bexçeyê xwendinê li hemû bajaran ava bikin'**

Ebûd Meqsû di berdewamiya axftina xwe de wiha got: "Yekîtiya Rewşenbîran, Desteya Perwerdê, Çapxaneya Şilêr piştgiriya bexçeyê xwendinê dike, hin nivîskar jî berhemên xwe diyarî bexçeyê xwendinê dikin. Herwiha li bajarê Hesekê jî me bexçayekî xwendinê li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê vekir, di vî bexçeyî de jî pirtûkxane û hola çalakiyan heye. Niha jî em hewl didin ku pirojeyê bexçeyên xwendinê ji bo bajarên din jî vekin, piroja niha ku li pêşiya me ye; vekirina bexçeyekî li Girkê Legê ye."

**'Xwendin riya pêşketinê ye'**

Ebûd Meqsû axftina xwe wiha qedand: "Ez bang ciwanên nûjen dikim ku berê xwe bidin bexçeyê xwendinê û çanda xwendinê pêş bixin. Ji ber ku xwendin mirovan jîr û zane dike. Hêviyên min ewe ku zimanê kurdî zimanê dayikê zêde li pêşxin û bi giştî nivîskarê me cihê xwe di bexçeyê xwendinê de bigirn. Herwiha di destpêka vekirina bexçeyê xwendinê de, kesên dihatin bexçe zêdeyî xwe helbest dixwendin, piştî wê çanda xwendina roman, çîrok û nivîsên cûda jî pêş ket. "

# Kevintirîn gundên Aşûriyan: Til Nesrî

**Gelek Aşûrî ji ber komkujiyên Osmaniyan li ser wan de pêk dianîn, ji Colemêrgê ber bi çemê Xabûrê ve hatin, gund ava kirin. Yek ji wan gundên herî navdar gundê Til Nesrî ye ku ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve Dêra wê hatibû teqandin û gund hatibû rûxandin, niha bûye strageha koçberên Efrîn, Serêkaniyê û gundewarên Til Temirê.**

Gundê Til Nesrî ango bi zimanê aşûrî (Walto) yek ji gundên Aşûriyan e li Navçeya Til Temirê, li qiraxa çemê Xabûrê yê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dikeve. Li gorî Aşûriyên ku ji me re dibêjin, Til Nesrî ji bedewtirîn gundên Aşûriyan e. Yek ji ber ku çandiniya wê li pêş bû, darên henar, tû û hemû rengên fêkî û zebzeyan lê diçandin û berhemên wê ji Heleb û Qamişloyê re dihatin şandin. A din jî malên wê yên bi qube û zîrekbûna jinan. Hemû Aşûriyên ku li Sûriyeyê dijîn, dihatin serdana gundê Til Nesrî dikirin, bi meqseda bêhnvedanê bistînin û li xweşikbûn û ava wê mêze bikin. Ji ber ku gund li qiraxa çem bû hemû kesên ku li wir dijin û serdan dikirin di Xabûrê de, avjenî dikirin.

**Ji Colemêrgê ber bi Xabûrê ve**

Dîroka Til Nesrî vedigere sala



1935'an. Wê demê gund ji çend xaniyên bi ax ên qubeyên Aşûrî ku herî zêde ev şêwaz li Iraqê tê dîtin, hatiye avakirin. Aşûriyên ku ji Til Nesrî wê demê dest bi jiyanê kirin, ji herêma Colemêrgê ku li Başûrî Tirkiyeyê ye, hatibûn koçberkirin. Til Nesrî gundekî navdar e û heya niha jî çavkaniya werzîşê li Kantona Hesekê ye. Ji tîma biskilêtên jinan bigre heya tîma voleybola wan ku li ser asta welatê Ereban, gelek xelat girtine. Yek ji sembolên gund lîstikvana bi navê Îştar Odîşo ye ku di avêtina gogê de şampiyona komarê ye û di cîhana Ereb de, ya duyemîn bû. Lê hemû wêne û bîranînên wê tîmê ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hatin şewitandin.
Dêra Meryem El-Ezra ya Til Nesrî yek ji kevintirîn dêrên li Sûriyeyê ye ku di sala 1934'an de hatiye avakirin. Her wiha bi şêwazeke nûjen piştre hatiye sererastkirin û di 2005'an de jî hatiye vekirin.

**Til Temir Paytexta Aşûriyan bû**

Til Temir paytexta Aşûriyan bû lê bi destpêkirina şerê Sûriyeyê re, êrîşên Cebhet El-Nursa, DAIŞ û îro dewleta tirk a dagirker, tenê 900 kes lê mane û dibe ku wiha kêmtir bibe. Ger ku dewleta tirk êrîşên xwe berdewam bike, ji ber ku ji gelê Kurd û Ereb zêdetir xetere li ser hebûna gelê Aşûrî heye. Bi taybetî Til Nesrî ku ji 1500 kesî pêk dihat, lê niha tenê çend mal ango kes lê dijîn.
Dêra Til Nesrî ku di cejna Meryem El-Ezra de bi hezaran aşûriyên bajar û gundan lê diciviyan, di 7'ê Adara 2015'an de ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve, hat teqandin. Piraniya gundên ku ketin destên çeteyan wê demê, dêrên wan ku vedigeriyan salên 30'î hatin teqandin. Bi vê teqandinê tawanên xwe yên li dijî mirovahiyê û exlaq û rêzgirtina ji netew û rûmeta ola wê re, dan der.

**Ev bû, diyariya DAIŞ'ê ji Aşûriyan re**

Di wê rojê de çeteyên DAIŞ'ê gotin: "Em ê di cejna Meryem El-Ezra de diyariyekî diyarî gelê Aşûrî yê ku li qiraxa çemê Xabûrê dijî, bikin. Her kes ji vê gotinê ango ji vê peyamê bi guman bû. Her Aşûriyek dihizirî ka wê çeteyên DAIŞ'ê çi bikin û ev çi diyarî ye. Lê Aşûriyan roja 7'ê Adara 2015'an, bi dengê teqandina Dêra Meryem El-Ezra ya Til Nesrî çavên xwe vekirin. Yekem gotina ku bihîstin teqandina dêrê bû. Dêrê cihekî xwe yê girîng û ruhî di dilê Aşûriyên Xabûrê de çêkiribû. Di Sibatê de jî Dêra gundê Til Hurmiz a dîrokî ku ji kevintirîn dêrên li Sûriyeyê bû, şewitandin û teqandin.

**Şande daxwaza serdana wê dikin**

Dêra Til Nesrî teqandin lê sûrên wê hîn li ser xwe ne û zingilê wê li erdê ye. Çi şande derbasî navçeya Til Temira Kantona Hesekê ya li Herêma Cizîrê dibin, daxwaza serdana wê dikin. Ji ber ku ew ji kevintirîn Dêrên li Sûriyeyê ye her wiha sûr û hilweşîna wê şahidiya hovîtiya hişmendiya çeteyên DAIŞ'ê dike.

**Bû starageha koçberan**

Bi destpêkirina êrîşên dewleta tirk a dagirker li ser Herêma Efrînê, bi hezaran malbat neçar man ku ji ber top û tangan koçber bibin. Ji ber Aşûriyên ku êşa koçberiyê jiyabûn, 138 malbatên Efrînî hembêz kirin û ew li gundê Til Nesrî bi cih kirin. Di heman wextê de jî koçberên ku ji Serêkaniyê û gundewarên wê neçarî koçberiyê bûn, di 9'ê Cotmeha 2019'an de dîsa li wî gundî bûn mêvan û wî deriyê xwe ji koçberan re vekir. Niha li Til Nesrî koçberên ji Efrîn, Serêkaniyê û gundewarên wê û gundên girêdayî navçeya Til Temirê, hembêz dike. Lê ne tenê ew gund, Aşûriyan tevahî gundên xwe ku ji 32 gundan pêk tê, ji koçberan re vekirin. Gund têra koçberan nekirin, li şûna malan ji xwe re kon vedane. Bi êrîşên dewleta tirk a dagirker û çeteyên wê re, metirsiya li ser hebûna gelê Aşûrî ku berî niha bi 80 salî stargeh û paytexta wan bû. Heya ku rewşa şer hebe, Aşûrî nikarin vegerin jiyana xwe ya asayî û ji nû ve, gundê xwe ava bikin. Aşûriyên Til Temirê bi hevpeymanên navdewletî û herêmî yên qirker e, rû bi rû ne.

# Şopa Şehîd Îsa Hiso hîn jî zindî ye

Şehîd Îsa Hiso yek ji pêşengên Rojavayê kurdisatnê ye ku ji bo gel û civaka xwe tekoşîneke bêhempa kir. Hevalên şehîd Îsa Hiso ew bi bîr anîn û soza şopandina riya wî, dan.

**Avesta Menaf/Qamişlo**

Li Rojavayê Kurdistanê, wekî perçeyên din yên kurdistanê jî, bi 10'an pêşeng û welatparêzên kurd yên ku jiyana xwe bi giştî xistine xizmeta welatê û civaka xwe de derketine holê, yêk pêşengên Rojavayê Kurdistanê jî Şehîd Îsa Hiso ye.

Îsa Hiso di Gulana sala 1954`an de li gundê El-Bora yê Qamişloyê ji dayik bûye, xwendina xwe ya seretayî li bajarokê Girbawî kiriye, qonaxên xwendinê yê navîn û amadehî li dibistanên Qamişlo qedandine. Fakulteya Hiqûqê ya Zanîngeha Beyrûtê xwendiye, lê di sala 3`yan de ji ber rewşa malbatê xwendina xwe daye sekinandin.

Îsa Hiso di ciwaniya xwe de bi rêya Osman Sebrî damezirînerê Partiya Demokrat a Kurdî li Sûriyê, di qonaxa xwendina xwe ya navîn de wek xwendekarekî welatparêz ê xwedî fikreke girêdayî çanda gelê xwe, bû endamekî fermî yê partiyê û heta 1982`yan di partiyê de dimîne.

Di 1983`yan de dema gihaştina fikrên Rêber Abdullah Ocalan ji Rojavayê Kurdistanê re, Îsa Hiso prensîb û rêgezên Tevgera Rizgariya Kurdistanê ji xwe re hilbijart. Di wan salan de fikrên Tevgera Azadiyê di nava bajar û navçeyên Rojavayê Kurdistanê de belav kirin û bû çavkaniyek ji rêya azadiyê re.

Ji ber bandora rihê berxwedanê yê Îsa Hiso, kurê wî Mesûd Hiso (Ferhad Baran) tevlî nava refên Tevgera Azadiya Kurdistanê bû û di 21`ê Tebaxa 2005`an de li Meşkan a herêma Geverê ya Bakurê Kurdistanê şehîd bû.

Di 2004`an de Îsa Hiso wek nûner û berpirsê têkiliyên derve yê giştî yê Partiya Yekitiya Demokratîk (PYD) hat hilbijartin. 2007`an wek nûnerê PYD'ê tevlî hilbijartinên Sûriyê bû, lê ji ber kiryarên bêdengikirina Kurdan û pêkanîna şantajê li dijî Kurdên ku dixwestin endamên PYD`ê hilbijêrin, endamên PYD'ê bi giştî neçar man ku xwe ji hilbijartinan vekişînin. Di 2007`an de Îsa Hiso careke din xwest xwendina xwe li zanîngeha Şamê berdewam bike, lê desthilata Sûriyê rê li ber pêşkêşkirina ezmûnên fakulteyê ji bo wî digire.

### Girtin û lêpirsîn

Di 2004`an de ji ber bûyerên Serhildana 12`ê Adarê, Îsa Hiso zêdetirî 3 mehan ji aliyê rejîma Sûriyê ve hat girtin. Di 14`ê Tîmeha 2006`an de Îsa Hiso li taxa Şêxmeqsûd a Helebê beşdarî merasîma bîranîna şehîdên Tevgera Azadiyê bû û ji ber bîranîna şehîdan jî hat girtin û 3 mehan di zindanê de ma. Di sala 2007'an di meşa li dijî êrîşên dewleta Tirk a dagirker ên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê de ew û komeke hevalên wî rastî lêdanê hatin. Piştre zêdetirî salekê girtî man. Îsa Hiso di 3`yê Tebaxa 2008`an de hat berdan, rojekê piştre careke din ji aliyê rejîma Sûriyê ve hat girtin û 15 rojan di hucreya yekkesî de ma. Di 2010`an de piştî vegera Îsa Hiso ji 4`emîn kongreya PYD'ê ya li Başûrê Kurdistanê, ji aliyê rejîma Sûriyê ve hat xwestin, wê demê jî 5 rojan di lêpirsînê de ma. Di eynî mehê de ji Qamişloyê şandin Şamê, li wir jî 23 rojan di bin îşkence û lêpirsînê de ma. Piştre jî di 13`ê Mijdara heman salê de Hiso radestî beşa Ewlekariya Siyasî kirin, li wir jî 3 mehan di lêpirsînê de ma. Di 10`ê Sibata 2011`an hat berdan. Piştî ew qas girtin û îşkenceyê rejîma Sûriyê cezayê qedexekirina derketina ji bajar jî da Îsa Hiso.





### Şoreşa 19'ê Tîrmehê

Piştî salên tijî girtin û îşkenceyê Şoreşa 19`ê Tîrmehê dest pê kir. Di destpêka şoreşê de Îsa Hiso cihê xwe di avakirina meclis û komînan de girt. Di 2012`an de yekemîn kongreya Meclisa Gel a Rojavayê Kurdistanê hat lidarxistin, tê de Îsa Hiso wek endamê dîwana serokatiyê hat hilbijartin, di heman salê de bû endamê Komîteya Têkiliyên Derve ya Neteweyî û Kurdistanî di Desteya Kurdî ya Bilind de. Destpêka sala 2013`an Îsa Hiso bû endam û rêveberê Rêveberiya Giştî ya Têkiliyên Dîplomasiyê ya Rojavayê Kurdistanê.



Mehmûd Hemê



Mihemed Kûzî

Di sibeha 30`ê Tîrmeha 2013`an de, dema Îsa Hiso bi xwesteka çûyîna werzîşê ji malê derdikeve û berê xwe dide erebeya xwe ya li ber mala wî li taxa Kornîş a Qamişloyê, erebeya wî teqandin û Îsa Hiso şehîd dibe.

Derbarê jiyan, kar û xebatên Şehîd Îsa Hiso de hevalî wê,endamê Meclisa Giştî a PYD`ê Mehmûd hemê û Mihemed Kûzî ji rojnemeya me re axaivîn.

Mehmûd Hemê taybetmendiyên şehîd Îsa Hiso bi bîr xist û got: "Em nikarin taybetmendiyên şehîd Îsa Hiso di çend gotinan de bibîr bixin. Welatparêzek bû ku jiyana xwe kiribû oxira doza welatê xwe, di jiyana me de mohra wî hîna zindî ye, ew ji bo me hêz û moralekî mezin bû. Dû wî, têkoşîn mezintir bû, ev jî îsbat dike ku dijmin di têkbirina têkoşîna gelê me de têk çû."

### ` Jêdera hêviyên gelan bû `

Hemê wiha brdewamî da axftina xwe û got: "Îsa Hiso ji ber eşqa welat û xwestina afirandina çarenûseke nû ji gelê xwe re, berê xwe dida jêderên hêviya gelan. Îsa Hiso dihat hezkirin, ji ber ku bi eşq nêzî karê xwe dibû, bi rihekî fedakar ji bo doza welatê xwe digeriya. Kesên ku bi Şehîd Îsa re dan û standin dikir, li ser esasê kesayeta wî ew jî nêzî welatê xwe dibûn."

Mihemed Gozî jî diyar kir ku Îsa Hiso ji bo wan moral û hêz bû û wiha got: "Destpêka sala 2013`an Îsa Hiso bû endam û rêveberê Rêveberiya Giştî ya Têkiliyên Dîplomasiyê ya Rojavayê Kurdistanê. Her wiha ew jî yek ji pêşengê rojava ya, ku bi hêz, îradeya xwe di hat naskirin, di heman demê de, tiştek ji xwe re ne dikir asteng. Xwe bi hedef û armaca xwe ve girêdayê bû, da ku bigihîjin mafê xwe yê kurdan û nasnemeya xwe. Bi tekoşîn û israrkirin kar û xebatên xwe dide meşandin."

Kûzî da zanîn ku bi hedefgiritina kesayetên pêşeng wekê Îsa Hiso, dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê, hewil didin ku îradeya gelê kurd têk bibin û wiha domand: "Kesayetên ku bi fikir û felsefeya Rêber Abdullah Ocalan xebatê dikin, da ku karîbin civakekî dîmokiratîk û azad bidin avakirin, her dem dibin hedfa dagirkeran. Lê ev kesayetên wekî Şehîd Îsa Hiso, piştî şehadeta xwe jî, ji bo gel dibin hêz û îrade."

Mihemed Kûzî di dawiya axaftina xwe de wiha got: "Em soza şopandina rêya şehîdan û parastina nirxên nîştimanî, herwiha berdewamkirina berxwedanê û pêkanîna yekitiya nîştimanî, nû dikin."

# Yekîtiya Cotkaran û Sewaldariyê

**Ronahî Sadûn**

**Ji bo rêxistikirina cotkar û sewaldarên herêmê, di 19`ê Cotmeha 2019`an Yekîtiya Cotkaran û Sewaldariyê li bajarê Qamişlo hat damezrandin. Bi armanca alîkariya cotkar û sewaldaran li tevahiya herêmê kopratîfên hatin vekirin.**

Gelên bakur û Rojhilatê Sûriyê bi awayekî sereke bi çandinî û sewaldariyê debara jiyana xwe dikin. Bi armanca destekdayîna cotkar û sewaldarên herêmê, herwiha pêşxistina rewşa aborî ya civakê, di sala 2019`an de Yekîtiya Cutkara û Sewaldariyê li bajarê Qamişlo hat avakirin. Di nav yekîtiye de jî jin bi awayekî çalak cihê xwe digrin û tevdigerin.

Derbarê kar û xebatê Yekîtiy Cotkara û Sewaldariyê, hevserokê Yekîtiya Cotkara û Sewaldariyê ya bajarê Qamişlo Nûrdîn Ebdullah ji rojnama me re axivî.



Nûrdîn Ebdulla balkişand ser kar û xebatê Yekîtiya Cotkara û Sewaldariyê û wiha got: "Di destpêka avakirina Yekîtiya Cotkaran û Sewaldariyê de, tevgera kar û xebatê cotkaran bi awayekî kêm bo, lê bi demê re asta kar û xebatê me berfireh bûn, bi taybet di aliyê rêxistinî de, ji ber bingeha kar û xebatê me rêxistinkirina cotkara ye. Herwiha Yekîtiya Cotkara û Sewaldariyê bi beşê çandiniyê ya Rêveberiya Xweser re hevgirtiye. Kopartîfên Yekîtiya Cotkara û Sewaldariyê li 7 herêman hene mîna herêma Reqa, Tebqa, Minbic, Kobanê, Dêra Zorê, Qamişlo û Hesekê ye, kopratîvên Sewaldariyê weke ya Deveyan, Hespan û yên çandiniyê jî mîna kopertaîfa darê Fêkî ye. Tevahî kar û xebatên herêma bi heve girêdayî ne, eger lawazî dikeve aliyekî bandorê li aliyên din jî dike."

### 'Dema çandinî nebe sewaldarî jî nabe'

Nûredîn Ebdullah da xuyakirin ku bi sedema Kêmbûna barîna baranê di salên bûrî de, li pêş kar û xebatê cotkariyê astengî derketin û wiha got: "Di 4 salên bûrî de, bi sedema kêmbûna barîna baranê li herêmên Rojava, di her dû aliyên çandinî û sewaldariyê de, ziyanek gihişt cotkaran, ji ber sewaldarî bi çandinêyê ve girêdayî ye, dema çandinî nebe sewaldarî jî nabe, lê rêjeya çandiniyê ya îsal baş bû. Debara civakê bi giştî li ser çandinî û sewaldariyê ye, ev jî ji Yekîtiya Cotkaran re barekî girane. Di riya kopratîf û perwerdeyan de em kar û xebatên cotkaran birêxistin dikin, asta kar û xebatê her bajarekî ji hev cudaye. "

### 'Bingeha çandiniyê jin e'

Nûredîn Ebdullah bal kişand li ser rola jinê di Yekîtiya Cotkaran û Sewaldariyê de û wiha got: "Rola jinê di çandinî û lawirvaniyê de, bi civaka xwezayî re destpêkiriye û heya niha berdewame, ji ber di destpêka civaka xwezayî de berhemên çandinyê û kedîkirina lawiran cara yekem li ser destê jinê pêk hatiye. Herwiha jin di hemû qadên civakê de cihê xwe girtiye û di aliyê tevlîbûn û pêşketina kar û xebatê kompratîfên Yekîtiya Cotkatan de jî gavin baş avêtin e. Lê mixabin em heta niha jî neghiştine asta ku em pirojeyan ji bo jinan ava bikin. "

### 'Êrîşên ser Rojava li hemberî pêşketina çandinî û sewaldariyê dibe asteng'

Hevserokê Yekîtiya Cotkara û Sewaldariyê Nûredîn Ebdulla axftina xwe wiha qedand: "Êrîşên dagirkeriyê yên ser Rojava bû sedema derketina gelek astengiyan li pêş çandinî û sewaldariyê; wek kêmbûna semad û dermanên sewaldariyê.

Herwiha êrîşê dewleta tirk a dagirker li ser herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ye, ziyaneke mezin gihand cotkaran, di salên borî de, gelek zeviyên cotkaran yên nêzî sînor ji aliyê dewleta Tirk û çeteyên wê ve hatin şewitandin. Ji bo çaresekirina tevahiya pirsgirêk û astengiyên ku derdikevin pêş cotkar û sewaldaran, pêwîstiya me bi hevgirtineke xurt ya di navbera cotkar û sewaldarên herêmê de heye. Eger em karibin rewşa çandinî û sewaldariyê li hermê pêş bixin, wê ji bo civakê bibe bingeha aboriyê."



# Di salvegera fermana Şengalê de êrîşên dagirkerên Tirk

**Navenda nûçeyan**

**YPG`ê ragihand ku di êrişa dewleta Tirk a dagirker a di salvegera fermana Şengalê de 4 hevrêyên wan ên ku bi salan li dijî çeteyan şer kirin, şehîd bûne û nasnameyên wan eşkere kirin. YPG`ê diyar kir, "Dewleta Tirk a dagirker bi vê êrîşê dixwaze tola DAIŞ'ê hilîne."**

Navenda Ragihandinê ya Yekîneyên Parastina Gel (YPG) têkildarî mijarê li ser malpera xwe ya fermî daxuyeniyek nivîskî weşand.

**Daxuyanî bi vî rengî ye:**

Êrîşên dewleta Tirk a dagirker û mêtînger ên li ser Bakur û Rojhilatê Sûriyê roj bi roj didomin. Gund û bajarên me bê ser û ber tên topbaran kirin bi vî rengî hewl didin aramiya herêmê têk bibin. Ji ber ku hêzên navneteweyî li hemberî êrîşan bêdeng in, dewleta Tirk a dagirker ji vê bêdengiyê sûd werdigre û êrîşên xwe zêde dike. Di salvegera komkujiya Şengalê de, di 3'ê Tebaxê de li gundê Hirmeşêxo yê girêdayî kantona Qamişlo, wesayîtek hate hedef girtin. Di wesayîtê de 4 fermandar û 2 şervanên me yên ku di betlaneyê de bûn hedefa vê êrîşa namerdane. Hevrê û fermandarên me Diyar, Garzan, Hîwa û Orhan şehîd bûn. Dewleta Tirk a dagirker bi vê êrîşê hema bêje dixwaze tola DAIŞ'ê ya ku li Şengal û Rojava têk çûye, hilîne. Her 4 rêhevalên me yên şehîd bi salane li dijî êrîşên dagirkeriyê, bi taybetî li dijî êrîşên çeteyên artêşa azad, El-Nûsra û DAIŞ bi wêrekiyeke mezin şer kirin. Tevlêbûna van hevrêyên me bi taybetî di şerên sala 2014-2019'an de li dijî DAIŞ'ê bêhempa bû. Ji bo wê fedakarî û keda wan wê ti carî neyê jibîrkirin û her tim di têkoşîna me de bê bîranîn. Li ser vê bingehê di serî de malbatên hêja yên her çar hevrêyên me, em sersaxiyê ji gelê xwe yê welatparêz ê Bakur-Rojhilatê Sûriyê re dixwazin. Em careke din soza xwe dubare dikin ku emê şopdarên xeyalên hevrêyên xwe bin û tola wan hilînin.

Gelê Qamişlo ne tenê ji destpêka Şoreşa Rojava de, di serdema ku Rêber APO hat Rojhilata Navîn, ev nêzî 50 sal in kevneşopiya berxwedanê ya bênavber didomîne. Li ser fikir û ramanên Rêbertiyê jiyaneke alternatîf a li dij-sîstemê avakirin. Gelê me yê Qamişlo di buyerên sala 2004'an de bi helwesteke tund li dijî hewldanên fitne û dijminahiya gelan rabûn û bi bedelên giranbiha ve rê li ber şoreşa Rojava vekir. Bi vî rengî kevneşopiya serhildanê domandin û bi hezaran zarokên xwe beşdarî nava refên azadiya Kurdistanê kir. Di 11 salên dawî de ji bo parastina avakirina şoreşa Rojava ji heft heta heftî salî seferberbûn û ji bedel dayînê gav paşde neavêtin. Di şerê me yê li dijî DAIŞ'ê de ciwanên Qamişlo bi şervantiyeke pir xurt her dem di eniyên herî pêş ên cengê de bûn. Bi qasî ku di şer de jêhatî bûn, kesayetên ku fermandariya şer jî dikirin afirand. Rêhevalên me Diyar, Garzan, Hîwa û Orhan ku her yek ji wan ciwanên hêja yên bajarê Qamişlo bûn, di her kêliya jiyana xwe de welatparêzî, berxwedan, şervantî û dilwêrekiya gelê Qamişlo nîşan dan û bûn milîtanên giranbiha yên têkoşîna me ya azadiyê.



Piştî şerê navxweyî yê ku di sala 2011'an de li Sûriyeyê pêş ket, dema ku Kurdan li Rojavayê Kurdistanê dest bi avakirina sîstema xweparastinê dikirin, rêhevalê me Diyar ku li Qamişloyê ji dayik bû û mezin bû, mîna xwişk û birayê xwe beşdarî doza azadiya gelê xwe bû. Yek ji hevalên me yên yekemîn bû ku pêvajoya şoreşa 19'ê Tîrmehê bi awayek veşartî û aktîf beşdarî xebatên rêxistinkirinê bû. Di sala 2013'an de dema me li dijî çeteyên Cebhet El Nusra şer dikir, li eniyên Til Elo û Serêkaniyê cihê xwe girt. Her wiha beşdarî operasyonên Til Hemîs û Til Birak'ê bûye. Di pêvajoya ku DAIŞ'ê êrîşî Şengalê kir, pêşî çû Cezaa, piştre jî derbasî Şengalê bû û di rizgarkirina gelê me yê Êzidî de rola xwe ya dîrokî leyîst. Di pêngavên leşkerî yên ku me li dijî DAIŞ'ê da destpêkirin de, hevalê me Diyar di operasyonên Şedadê, Silûk, Til Temir, Hesekê, Minbic û herî dawî jî li Dêrazorê, weke şervan û fermandar pratîkeke şer a serkeftî da meşandin.

Hevalê me Orhan ku di nava hevalên xwe de bi navê Aram tê naskirin, ew jî di nava malbateke welatparêz a Qamişlo de ji dayîk bû. Bi şoreşa 19'ê Tîrmehê re yekem gava xwe avête nava jiyaneke nû. Şoreşa Rojava ku pêşî li herêmê, piştre jî li hemû cîhanê bandora xwe kir, bû hedefa çeteyên dewleta Tirk a dagirker ku pal pişta hêzên çete bû. Hevalê me Orhan ji bo hêzên ku dixwazin destkeftiyên şoreşa Rojava ji holê rabikin û herêmê dagir bikin, di demên herî dijwar ên berxwedana me ya ku ji Serêkaniyê destpê kir û li Dêrazorê DAIŞ têk bir, hertim li gel hevrêyên xwe di çeperên pêş de bû. Hevalê Orhan ku di pêngavên azadkirina gelek bajarên di bin dagirkeriya DAIŞ'ê de cih girt, di sala 2015'an de li bajarê Til Temirê birîndar bû. Lê ruxmê birîndariya xwe ya giran jî tekoşîna xwe ya li dijî hêzên dagirker neda rawestandin û ji hevrêyên xwe yên cengê qut nebû. Bi saya azweriya xwe ya bilind a ji bo azadiyê û dilsoziya xwe ya bi rêhevalên xwe re, careke din bi awayek çalak tevlî xebatên şoreşê bû. Di pratîka xwe ya şerê dijwar de perwerdeya xwe îhmal nekir. Hem di warê bîrdozî de hem jî di warê pisporiya di şer de xwe perwerde kir. Bi vî rengî di hemleyên rizgarkirina herêmê ji çeteyên DAIŞ'ê bi awayekî aktîf tevlê dibe. Vê carî di sala 2017'an de di pêngava rizgarkirina Reqayê de her du dest û lingekî xwe winda kir, lê ti carî bi afirîneriya xwe ya mîna çûka Ankayê ji têkoşînê dûr neket. Hevalê Orhan ê ku piştî tedawiya xwe vegeriya nava kar û xebatê, zanî ku ji ber berpirsyariya nasnameya xwe ya Gazîtîyê divê ji hevalên xwe zêdetir ked, fedakarî û hewldan raber bike.

Hevalê me Garzan ku ew jî di malbateke welatparêz a Qamişlo de ji dayîk bûye, di sala 2013'an de di dema şerê dijwar ê li dijî çeteyan de tevlî nava refên me bû û pêşî di perwerdeyên bîrdozî û leşkerî re derbas bû. Di destpêka sala 2014'an de yekemîn ezmûna xwe ya şer di operasyona Til Berak de bi dest xist. Piştre di şerê li dijî êrîşên Til Marûf û Şedadê de şervantiyê xwe pêşxist û di pêngava rizgarkirina Minbicê ji çeteyên DAIŞ bi awayekî xurt û bi pisporiyeke mezin cihê xwe girt. Hevalê me Garzan ku piştî sala 2016'an xebatên cuda dimeşîne, ji bo ku xwe pêş bixe, beşdarî perwerdeya pisporiyê ya branşan bû. Bi qasî ku di şer de jîr û jêhatî bû, bi heman rengî di perwerdeyê de jî helwesteke serkeftî nîşan da.

Rêhevalê me Hîwa di malbateke Kurd a welatparêz a bajarê Reqayê de ji dayîk bû. Di sala 2013'an de rêhevalê me Hîwa û malbata wî ku nexwestin li Reqa ya ku pêşî Cebhet El Nûsra û piştre jî ji aliyê çeteyên DAIŞ'ê ve hate dagirkirin, neçar man ku koçî bajarê Qamişloyê bibin. Hevalê Hîwa di sala 2014'an de ji bo ku li dijî hovîtiya DAIŞ'ê şer bike, di nava çeperên berxwedanê de cih girt. Di şerê 6 salan ê bênavber ê li dijî DAIŞ'ê de, beşdarî operasyonên Til Hemîs, Hesekê, Serêkaniyê, Girê spî, Tişrîn, Minbic, Reqa, Tebqa û Dêrazorê bû. Di her pêngavekê de bi hevaltiya xwe ya mînak û bi cesareta xwe şêwazê şervantiya demê di kesayeta xwe de avakir. Li ser vê bingehê em careke din soz didin her çar hevrê û fermandarên xwe yên qehreman ku emê tola wan hilînin û siberojeke azad diyarî gelên herêmê bikin."

# Kiryar û êrîşên dagirkeriyê li ser gelê Efrînê

**Esma Miştefa/ Şehba**

**Dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê li kêleka kiryarên dijmirovî yên ku li Efrînê pêk tînin, êrîşên xwe li ser herêma Şehbayê zêde dikin û bi her awayî sivîlan dike armanc**

Ji destpêka dagirkirina herêma Efrînê yê ku di 18'ê Adara 2018'an de ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê û çeteyên girêdayî wê ve, bi darê zorê gelê resen ji mal û milkên xwe koçberî herêma Şehbayê bûn. Bi dagirkirina bajarê EFrînê dakirkeriya Tirkiyê û komên çeteyan dest bi talan kirina sererd û binerda Efrînê kirin.

### Xwezaya Efrîmê tê binpêkirin

Efrîna ku bi xwezaya xwe ya xweşik û darên zeytûnan tê nas kirin, komên çeteyan bi hezaran dar û daristanên hemwelatiyan qut kirin û weke rêbazeke tîcaretê bikar anîn. Dewleta Tirk ya faşîst darên zeytûnan bi temamî ji erdê radike û li erdnîgariya Tirkiyê dide çandin. Li hember van bin pêkirinan hemwelatî ji parastina mafê xwe bê par e.

Di sala 2023'an de bi giştî li 65 cihan dar hatine birîn. Zêdetirî 13 heazar darên herêmê û yên hemwelatiyan hatine qut kirin.

### Kiryarên dagirkeriyê yên li ser jin û gel berdewam e

Bi hezaran jinên Efrînî hatin Kuştin û destdirêjî li wan hatin kirin, girtîgehên taybet yên jinan li tavahî navçeyan hatin avakirin; di wan girtîgehan de jin rastî hemû rê û rêbazê zordariyê tê, tavahê cureyên destdirêjî û bê exlaqiyê li ser wan tên meşandin, jin li ber çavên, hevjîn, dayîk û bavê xwe tên girtin û çarenûsa wan ne diyar e.

### Di 2023'an de destdirêjiyên ku hatine kirin

Ji destpêka sala 2023'an de li gorî



bîlancoyên hatine belgekirin, 133 kes hatine revandin, jê 22 jin in, 18 kesên temen mezin û 5 zarok in. Ji aliyê komên çeteyan ve zêdetirî 36 kesan destdirêjî li wan hatine kirin, her wiha ji aliyê çeteyan ve 3 jin hatine tercawîzkirin, di heman demê de di encama van kiryaran de 9 welatî, 3 jin, 3 welatiyên temen mezin û 1 temen biçûk hatine kuştin.

### Malên mêtîngeriyê

Dagirkeriya Tirkiyê ji bo guhartina demografiya Efrînê malên mêtîngeriyê dide avakirin. Bi dehan mal û kamp li tavahî navçeyan avakirine. Ji destpêka 2023'an ve,10 malên mêtîngeriyê hatine avakirin,

her wiha 5 kamp û 8 komele û rêxistin hatine avakirin.

Tevî van kiryarên ku di Efrînê de berdewam dike, dagirkeriya Tirkiyê êrîşên xwe li ser gelê herêma Şehbayê bi carekê nedaye rawestandin.

### Li gorî bîlancoya Ragihandina leşkerî êrîşên dagirkeriyê di meha Hezêranê de wiha ne:

Di 23'yê Hizîrana 2023'an de, di encama topbarana li dijî nuqteyekî hêzên hıkumeta şamê li gundê bênê 3 leşker birîdar bûn.

Di 29'ê Hizîrana 2023'an de, di encama topbarana li navçeya Til Rifatê de welatiyek bi navê Azad hisên guldedo birîndar dibe.

Di 30'ê Hizîrana 2023'an de, li navçeya Til Rifat a girêdayî herêma Şehbayê li komîna 14 bombebaran ki,r zirarên madî çêbûn, di heman rojê de li balafirgeha Minnixê ya girêdayî herêma Şehba nuqteyekî hêzên hikumeta şamê bombebaran kir di encamê de 1 leşkerê hikumeta şamê jiyana xwe ji dest da û 6 leşker jî birindar bûn.

Di di 31'ê Hizêrana 2023'an de di encama topbarana dijwar a li gundê Kolûtê de, 2 welatî birindar bûn, 1 jê zarok û 1 jin bû.

# KURDISTAN NE GORISTAN E!

**Cîger Dilşad**

Dagirkerên Kurdistanê gava dîtin ku bi kuştin û qirkirinan nikarin gelê Kurd tune bikin û wan ji nirxên wan yên netewî û civakî bi dûr bixin ,îcar dest avêt çand,ziman û nirxên Kurdan. Di gel wê jî hemû derfetên madî yên jîyanî (heta bi avê) ji ser Kurdan birîn ku,Kurd terkî axa xwe bikin û bi wî awayî jî qirkirina Kurdan yak u di sala 1925 de nîvî mabû bigihînin encamê.Tişta îro li dijî tevahî Kurdan tê kirin ev e! Bi taybetî jî li dijî Rojava ev sîyaset bi awayekî pir kûr û berfereh tê meşandin.Bi her awayî di serî de ciwanan-mirovan didin revandin. Gotineke Pêşîyên Kurdan heye ,ku dibêje; "Li welatê xerîbîyê mirov kor e" Ev gotin berê rastbû! Lê îro pir kêm e! Îro ne bi tenê kor e,tuneye! Ji xwe gelek kes ji berîya ku bigihînin Ewropa di deryayan de ji masîyan re dibin xwarin û heta cendekê wan nayê dîtin.Cendek were dîtin jî îcar bi mesrefeke mezin cendek tînin û di axa welat de vedişêrin.Gelek kes jî bi dehan sal li dervayî welat jîyan dikin,gava dimirin, cendekê wan tînin li vir vedişêrin.Tu dibêjî qey welat ne warê jîyanê ye,goristane!Ne ji boyî yên dijîn e, ji bo mirîyan e!Heger welat ne ware ku mirov lê bijî,çima cendekê xwe dişînin welat.Halbûkî mirov 60-70 salî dijî,lê hestîyên mirov bi sedan,hezaran sal dijî. Cîhekî ku naxwezim 60-70 salî lê bijîm, qet razî nabim ku hestîyên min jî li wir bijîn!

Welatê me vê nêzîkbûnê heq nake!Hele Rojava, ya ku bi xwîna bi deh hezaran keç û xortên herî jîr û delal û ji çar perçeyên welat ava bûye,nêzîkatîyeke wiha qet heq nake!Di axa Rojava de bi tenê xwîna zarokên Kurdan tune ye,sibê malbatên ku zarokên wan li vir xwîna xwe rijandine bixwezin werin li Rojava bijîn, tu kesek nikare ji wan re bêje"hûn nikarin li vir bijîn."

Tişta herî xirab ew e ku hin welatparêz ku bi salan girtin,kuştin dan ber çavan,lê bêyî li welatê xwe bijîn ,keda salan û nirên ku di destxistina wan de keda wan jî heye,berê xwe dan Ewropa ya xopan.

Tişta sosret ew e ku Kurdan digot ;"bila welatê me hebe,bila em birçî û tazî bin! " Halbûkî li vir ne kesek birçîye û ne jî tazîye.Di rewş û mercên îro de li ser axa ku di nav sînorên dewleta Sûrî de,li Bakur û Rojhilatê Sûrî cihê herî xwedî derfetên jîyanê ye!Zor û zehmetî hene,lê qet nebe mirov bi nirx û rûmeta xwe djîn.Ango mirovên li vir ,li ser axa xwe dijîn têkoşîna xwebûna xwe didin û wê di dîrokê de wek kesên li nirxên xwe xwedî derketine werin nasîn û wê nevîyên wan minetdarbin ji wan re ku ,dev ji axa xwe bernedane û neçûne Ewropa.

Her wiha yên diçin ji feqîrîyê gazincan dikin. Tu dibêjî qey wexta rêjîma Sûrî li ser Rojava serwerbû rewşa wan pir başbû,lê îro xirabûye.Diçin deh-panzdeh hezar dolar deyn dikin û xwe li deryayan didin,gelek ji wan dimirin. Yên ku xwe digihînin Ewropa jî di karên herî




xirab (ku hemwelatîyên wan tê de naxebitin)dişûxilin.Lê li Rojava mirov tu Kurdekî di karekî wiha de nabîne.Çimkî layîqî xwe nabînin. Halbûkî di serdema serdestîya rêjîma Sûrî de wan kesên ku îro tu karî layîqî xwe nabênin, ji tu karî re nedigotin na.Zemanê ku li Ewropa dixebitin li welatê xwe ,di nav gelê xwe de û bi nirx û rûmeta xwe bixebitin,hem wê welatê xwe zûtir ava bikin,hem wê nirxên xwe yên netewî û civakî biparêzin û bi pêşxin û tu kesek jî neheqîyê li wan nake.

Ji xwe yên hinekî rewşa wan ya madî baş e,ew ji berîya her kesî revîyan.Di vir de dixwazim mînaka yekî cihû bi navê Morîs bidim; Morîs yekî pir dewlemende .Sermandarîya Wî ji hemû dewlemendên Kurd yên berê xwe dane Ewropa pirtir e. Bi salan ji xwe re soz daye ku ,"gava weletê me ava bibe,ez ê herim tam salekê kolanên welatê xwe paqij bikim". Di sala 1948'an de gava dewleta Îsraîl saz dikin,tê Îsraîl û soza xwe pêktîne , sermaya xwe jî hêdî hêdî vediguhizîne welatê xwe.

Rast e,hinek şaştîyên Rêveberîya Xweser hene,derdikevin. Ji xwe çawa em ji kîsê xwe fêrî şer bûn,îro jî fêrî rêvebirinê dibin.Zarokên bindestan kengê herêmek-welatek bi rêve birine?Kengê rêvebirên ji gelên bindest nirxên civakî afirandine?Îro em wek Kurd û pêkahteyên herêmê karê herê zor dikin! .Hem şoreşê diparêzin,hem jî nirxên civakî diafirînin.Ev jî hinekî sebrê dixweze.Bê guman ev rastî nayê wê wateyê ku em çavên xwe ji kêmasîyan re bigirin .Lê kêmasî û şaşitîyên kesan nabe hiceta reva ji welatê xwe û terkirina nirxên xwe. Lê mixabin di şûna hesab bipirse û welatê xwe ava bike,direve.

Hinek Kurd jî dibêjin;" di rêveberîyê de ji Kurdan pirtir cih dane Ereban"Ev angeşta ji binî ve nerast e!Ev der çawa welatê Kurda ye,welatê ereba ye jî.Mafê Kurdan çî ye,yê Ereb,Ermen ,Aşûrî û gelên din jî ew e.Gelek karên ku Kurd layîqî xwe nabînin,kesên Ereb dikin.Di rastîyê de ev nêzîkatî dervayî Paradîkma Rêber Apo ye û divê di demeke kurt de bê sererast kirin.Kesên Ereb welatê xwe bernedane û çi kar hebe dikin. Divê em bizanin ku,kesên bi keda xwe ,bi nirxên xwe û li ser axa xwe dijîn,kesên ku rûmeta xwe diparêzin û nirxdar in.

Yên ji welat direvin ji gotinên neyar bawer kirine ne. Neyar welatê me wekî dojehê,goristanê raber dike .Divê em bersiva van pirsan bi awayekî rast bidin xwe û xwe naxapînin;

Çima neyar ji bo bidestxistina welatê me ewqas hewl dide ku bi dest xwe ve bîne?

Çima herî pir êrîşî nirxên me yên civakî û dîrokî dike?

Çima bi dehê salan keda me bi erzanî dibir û kesekî nediwîrî gotinekê bike?

Wê sibê çawa bersiva zarok û nevûyên xwe bidin,bêyî ku derewan bikin?

Wek gotina dawî vê bêjin; hêj pir dereng nebûye ,ji berîya ku li derva di nav pîsîtîya pergala kapîtalîst dimirin ,her kes vegere welatê xwe û em tev bi hev re welatê mîna bihuştê ava bikin û bi çanda xwe,bi ziman û nirxên xwe bijîn.

# 'Êrîşên dagirkeriyê dewamiya hişmendiya dijmin a sedsalî ye'

**Reşo Mihemed/ Qamişlo**

**Êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên ser bakur û rojhilatê Sûriyê û Qadên Berxwedanê bênavber dewam dikin. Endamê Desteya Rêveber a MSD'ê Ezher Ehmed da zanîn ku êrîşên dagirkeriya Tirk dewama hişmendî û planên qirkikrina gelê Kurd a Peymana Lozanê ye.**

Bi armanca têkbirina vîna gelan, dewleta Tirk a dagirker ji destpêka sala 2023'yan heta niha bi 10'ê caran bi balafirên bê mirov êrîşî herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê kiriye. Di encama van êrîşên hovane de bi 10'an welatî şehîd û birîndar bûne. Di heman çarçoveyê de, dagirkeriya Tirk êrîşên xwe li ser Qadên Berxwedanê jî, bênavber didomîn e. Artêşa Tirk ya dagirker di Tîrmehê de gelek caran bi balafirên şer, tang, top û çekên qedexwkirî jî, êrîşî Qadên Berxwdanê kir. Li hemberî êrîşên dagirkeriyê, Gerîlayên Azadiya Kurdistanê jî bi 10'ê çalakiyan li dijî artêşa Tirk a dagirker lidar xistine, di encamê de bi 10'an leşkerên dagirker hatine cezakirin.



Êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên li herêmê roj bi roj zêdetir dibin, dagirkerî li pêş çavên cîhanê jin û zarokan jî dike armanc. Li hemberî êrîşên dagirkeriyê yên hovane asta berxwedan û têkoşînê ya gelên herêmê bilintir dibe.

Derbarê êrîşên dewleta Tirk a dagirker yên ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê û Qadên Berxwedanê, Endamê Desteya Rêveber a Meclisa Sûriya a Demokratîk(MSD), Ezher Ehmed ji rojnameya me re axivî.

**'Êrîşên dawî dewamiya plana qirkirina gelan e'**

Ehmed da zanîn ku dagirkeriya Tirk bi heman hişmendiya Peymana Lozanê ya ku beriya sed salî hatiye imzekirin êrîşên xwe berfireh dike û wiha domand: "Sed sal di ser Peymana Lozanê re derbas bûn. Dagirkeriya Tirkiyê jî di vê sedsalê de gelek komkujî û sûcên dermirovî, di derheqê gelê kurd de pêk anîne. Di encamê de jî bi hezaran kes bûn qurbaniyên van êrîşan. Di heman demê de gelê kurd di pêşveçûna şerê sedsalî de, serî ji van êrîş û kiriyarên dagirkeriyê li tevaya Kurdisanê netewande. Êdî gelê kurd ji 1923'yan ve gelek şoreş li dar xistine. Êrîşên ku dagirkeriya Tirk li dijî Gerîlayên azad li Qadên Berxwedanê dike, di dema dawî de zêdetir bûne. Dagirkeriya Tirk bi hovîtî, bi çekên giran êrîşan dike. HPG'ê jî li hember van êrîşan berxwedaniyekê bêhempa dide meşandin. Di heman demê de jî dagirkeriya Tirk êrîşên bê navber li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê pêk tîne. Ev êrîş û kiryarên dermirovî yên ku dagirkeriya Tirkiyê dike, dewama hişmendiya Peymana Lozanê ne. "

**'Bêdengiya navneteweyî erêkirina sûcên dijmirovî ye'**

Ezher Ehmed diyar kir ku helwesta nediyar ya hêzên navdewletî yên li Sûriyê di derheqê êrîşên ku li ser herêmên bakur û rojhilatê Sûriyê de tên kirin siyaseta wan ya dijberî Rêveberiya Xweser dide nîşandan: "Ji destpêka ku Şoreşa 19'ê Tîrmehê dest pê bû û Rêveberiya Xweser hatiye damezrandin heya niha, pilanên qirêj li dijî vê rêveberiyê hatine gerandin. Herwiha siyaseta qirêj ya hêzên desthilatdar yên weke dagirkeriya Tirkî û çeteyên girêdayî wê, Rûsiya, Îran û hikumeta Şamê diyar e. Ew li dijî gelên Sûriyê û Rêveberiya Xweser kar dikin. Di heman demê de gelek civînan li dar dixin, weke Civîna Astana, Sûtşî, Cinêv û hwd. Van civînan jî, ji bilî berdewamkirina kirîza Sûriyê û êrîşên dagirkeriyê ti encam bi xwe re neanîne. Didema dawî de êrîş li ser herêmên me zêdetir bûn û gelek kesên sivîl û şervanên me şehîd ketin. Hîna jî ev êrîş bi bêdengiya hêzên navneteweyî didomin. Di heman demê de êrîşên ku ji aliyê dagirkeriya Tirkiyê ve tên kirin, xeteriyeke pir mezin li ser gelê me çêdike. "

**'Pêwîstî bi hevgirtina gelan heye'**

Endamê Desteya Rêveber ya MSD'ê, Ezher Ehmed anî ziman ku divê gelên Sûriyê û hemû gelên Rojhilata Navîn hevgirtina xwe li dijî hêzên desthilatdar ava bikin û axaftina xwe wiha qedand: " Êrîş û kiryarên hêzên navdewletî yên desthilatdar li ser herêmên me û tevaya Sûriyê tên kirin derencamên civînên ku tên lidarxistin in. Hêzên desthilatdar û dagirker kiriyarên dermirovî di derheqê pêkhateyên bakur û rojhilatê Sûriyê de dikin. Kiriyarên van hêzan jî heman hişmendiya hêzên ku Peymana Lozanê îmzekirin e. Rêveberiya Xweser û pirojeya wê ya bi fikirên yekîtiya gelan û netewa demukratîk e dibe bersiv ji Lozan û kiriyarên dagirkeriyê. Lewma divê hevgirtina gelên kurd, ereb, aşûr, tirk, faris û hwd çêbibe. Herwiha hemû gel bi Rêveberiya Xweser re vê pirojeyê bighînin serî. "



# Komkujî û planên dagirkeran nikarin vîna gelan bişkînin

Leyla Mehmo hevseroka Mala Êzîdiyan a Cizîrê û Welat Zerdeştî komisiyonê perwerda, girêdayî komkujiya 3'ê Tebaxê 2014'an a ku li ser Êzidiyên Şengalê ya ku bi destê çeteyên DAIş'ê hatî meşandin gotin:Ku komkujiya 3'ê Tebaxê şerma mirovahiyê û saziyên mafê mirovan e. Herweha şervnê YPJ- YPG û HPG û YJA-STAR jî yên ku gelê Şengalê rizgarkirine ew parêzvanê mirovahiyê ne.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Komkujiya Şengalê ya ku di 3'yê Tebaxa 2014'an de dest pê kir, ji ber hesab, çiqar û hevkariya hêzên herêmî û navneteweyî û PDK'ê gelê Êzidî weke qurbanî firotin şûrên tûndrewiya cîhanî ya ku DAIŞ'ê serkêşiya wê dike. Komkujiya ku tê de bi hezaran Êzîdiyên Şengalê hatin kuştin, revandin, tecawizkirin, koçberkirin û bi komkujiyeke ku mîna wê di dîroka mirovahiyê de nahatî dîtin li ser gelê Êzidî hate meşandin.

Di derbarê komkujiya Şengalê de, Leyla Ibrahîm Mehmo hevseroka mala Êzîdiyan a cizîrê û Welat Zerdeştî komisiyonê perwerda, ji rojnemeya me re axivîn.

Leyla Ibrahîm destnîşan kir: Ku"di destpêka Tebaxa 2014`an de, rêxistina çeteyên DAIŞ`ê dest bi komkujiyên bi armanca qirkirina gelê Êzidî û li ber çavê hemû cîhanê ev yek dane meşandin. Bêdengiya navneteweyî ya li hember sûcên dewleta Tirk, hîn bêtir cesaret û destekê dide kiryarên dij mirovî yên ku li hemberî gelê heremê têne meşandin.



Leyla Ibrahîm

Leyla diyar kir, ku êrişên ku li ser gel têne meşandin armanca wan qirkirina gelê kurd û gelên heremê ne. Çeteyên DAIŞ`ê bi piştgiriya dewleta Tirk a faşîst êrişî şengalê kir û di serî de jin û zarok, bi hezaran jin kuştin, revandin, tecawizkirin û heya niha gelek jin wendane û tu agahî ji wan nayê girtin. Ji ber vê yekê divê civaka navneteweyî demildest li dijî terora dewleta Tirk tevbigere û li hemberî faşîzma Tirk a ku sûcên herî hovane li dijî gelên herêmê dike bisekne û jêre bêje êdî bes e. Herweha pêwîste ku gelê kurd û tevahî azadîxwazên cîhanê ji hemû milî ve piştgiriyê bide gelê Êzidî. Di serî de alîkarî û piştgirî were dayîn ji bona ku tevahî Êzidiyên ku ji warê xwe û bi darê zorê koçberbûne vegerin ser cih û warê xwe. Li hemberî van hemû plan û êrişên ku bi armanca qirkirina gelê Êzidî têne kirin, weke ku her kes jî dizane yê ku gelê Şengalê û Êzidî parastin û ji qirkirinê rizgar kirin şervanê azadiya Kurdistanê bûn.



Welat Zerdeştî

**Berxwedana rûmetê berdewam e**

Leyla Ibrahîm Mehmo hevseroka mala Êzîdiyan a Cizîrê wiha axavtina xwe bi dawî kir û got:"Tevî hemû hewldanên êrîş, dorpêçkirin, girtin û kuştina Êzidiyan, piştî komkujiya 3'ê Tebaxa 2014'an, rêveberiya Şengalê hate avakirin û hemû saziyên civakî, ewlehiyê û bi vîna gel hatin avakirin û li hemberî hemû gef û êrişan gel hêza xwe ya parastinê avakir. Berxwedana gelê Şengalê bê navber berdewame û biryara gel heye ku li hemberî hemû êrişan xwe û deskeftiyên xwe biparêze û hemû planên heyî valederxîne.

Welat Zerdeştî da zanîn ku di 2014`an de, çeteyên DAIŞ`ê dest bi êrişa li ser Şengalê kirin û ev êriş rastî berxwedana Şengaliyan hat û di encama van êrişan de bi hezaran welatiyên sivîl şehîd bûn û gelek hatin revandin û bi darê zorê hatin koçberkirin.

Welat wiha axivî û got:"Bi êrişên DAIŞ`ê yên ser Şengalê re, di saetên sibê de, çekdarên Partiya Demokrata Kurdistanê (PDK) dest bi vekişînê kirin û gelê Êzidî bê parastin hişt û ew tûşî komkujiyê hiştin. Yekîneyên Parastina Gel (YPG- YPJ) dest bi vekirina korîdora mirovî ya herî mezin di dîrokê de kirin û ji bona rizgarkirina gelê Êzidî ketin nava liv û tevgerê. YPG û YPJ'ê bi sed hezaran Êziyên Şengalê ji komkujiyê rizgar kirin û gihandin cihên bi ewle û hemû planên DAIŞ'ê û dagirkeriyê valederxistin.

Welat Zerdeştî wiha axavtina xwe bi dawî kir û got:"Armanca êriş û komkujiyan şikandina vîna gelê Şengalê bû, lê yekîneyên berxwedana Şengalê û gelê Êzidî li berxweda û Şengal rizgar kirin. Ji ber vê yekê tu hêz nikara vîna gelê Êzidî bişkîne û wan tune bike. Em ê bi fikir û felsefeya Rêber Apo, li ser riya şehîdan bimeşin û em ê, xwe birêxistin bikin û xwe biparêzin û ji bona azadiyê her tekoşînê bikin. Rêber Apo ji bona parastina gelê Şengalê her tim hişyariya xeteriyê dikir û daxwaza parastina Êzidiyan li hemberî hêzên ku dixwazin wan qirbikin kir. Ji bona vê yekê jî ger ku ne ji Rêber Apo ba wê gelê Êzidî rastî gelek komkujiyên cuda hatiba û wê heyanî roja îro jî bê parastin maban. Lê bi saya fikir û bîrdoziya Rêber Apo, gelê Êzidî li Şengalê li hemberî hemû dek û dolabên dagirkeriya Tirkiyê û PDK'ê rêxistina xwe avakir û li ber xwe bide û hemû plan û hewildanên dagirker û îxanetê valederistin.

# 'Ji madeyên hişbir re na, erê ji jiyanê re'

**Esma Mistafa/ Şehba**

**Dijmin bi hemû cureyên Şerê taybet siyaseta xwe li ser gel û bi taybet jî ciwanan dide meşandin. Yek ji van rêbazan jî belavkirina madeyên hişbir di nava ciwanan de ye. Herêma Şehbayê herêmeke ku ji hemû milî ve di nava dorpêçêde ye. Hikumeta Şamê bi armanca careke din herêmê bixe bin serweriya xwe, zêdetirî 2 sala ye nahêle ku madeyên Sotemenî, derman û hwd derbas bibe. Dijmin ji hemû aliyan ve herêmê hedef digire û polîtîkeyên zirav li ser ciwanan dide meşandin. Yek ji van polîtîkeyan jî belavkirina madeyên hişbir e.**

Li hember van polîtîkeyên dijmin tavahî saziyên Rêveberiya Xweser xebatên berfireh didin meşandin. Bi taybet ev cure siyaset herî zêde li ser ciwanan tê meşandin. Her wiha bandora wê li ser laşê mirovan di aliyê tenduristî de, ji bo hişyarkirina ciwanan û civakê bi giştî. Desteya tenduristiyê û desteya ciwanan li herêma Şehbayê dest bi pêngava "Na Ji Madeyên Hişbir Re, Erê Ji Jiyanê Re" dan destpêkirin.

Girêdayî vê pêngavê ya ku wê nêzî 20 rojan berdewam bike. Rojnameya ronahî bi hevserokê desteya tenduristiyê Elye Mihemed û her wiha bi hevserokê desteya ciwanan Emîne Hej Ebdo re têkildar bû.

**Naverok û armanca pêngavê**



Elye Mihemed

Elye di destpêkê de têkildarî bernameya pêngavê de wiha got:"Ev pêngav ji aliyê desteya ciwanan û ya tenduristiyê ve hatiye destpêkirin. Ji ber ku herî zêde şerê taybet ciwan û jinan dike armanc û dixwazin bi vê yekê sinca civakê tar û mar bikin. Ev pêngav wê nêzî 20 rojan bê berdewam kirin. di gavên despêkê de me birûşor li ser asta herêmê belav kirin. Herwiha pangartên di derbarê xeteriya madeyên Hişbir li hin deveran daleqandin. Gava duyemîm wê semîner ji aliyê bijîşkan ve li ser bandora van madeyan li ser mirovan bê dayîn. Ev semîner wê di nava komîn, sazî û ciwanan de bên dayîn. armanca van dana van semîneran ewe, ku baldarî û hişyarî di nava civakê de bê avakirin".

**'Dijmin bi van siyasetan ewlehiya herêmê hedef digire'**

Elye anê ziman ku semîner wê di derbarê bandora van madeyan di aliyê tenduristî de bên dayî û wiha domand:"Em weke desteya tenduristiyê bêtir di aliyê tenduristî û



Emîne Hec Ebdo

bandora van madeyan li ser laş û hişmendiya mirov mijûl dibin. Semîner wê ji aliyê bijîşkên ku taybet bi van mijaran re eleqedar dibin wê werin dayîn. Bi taybet bikaranîna van medeyan bandoreke çawa li ser laş û hişmendiya însanan dike. Madeyên




hişbir li ser ciwanan bandoreke mezin dike û ev bandor bi rengekî lez çêdibe û êdî xelasiya wê zehmet e". Herwiha Eliye diyarkir ku ev hemle weke hemla xweparastinê ye û wiha got: "Ev pêngav ji bo civakê û ciwanan li hember siyaseta dijmin a şerê taybet û hedefgirtina ewlekariya herêmê û li hemberî xeteriyên vê yekê şêwazên xweparastinê û tekoşîna li hemberî vê xeteriyê.

**'Di şexsê ciwanan de civak tê hedefgirtin'**

Emîne bal kişand ser êrişên dijmin yên li ser herêmê û ziraviyên şerê taybet a ku li ser ciwanan tê meşandin û wiha got: "Êrişên dijmin di her alî de li ser herêmê tên domandin. Tavahî herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyê tên hedef girtin. Armanca dijmin di asta yekemîn de ewlehiya herêmê û tunekirina destkeftiyên ku hatine bidestxistin e. Li hemberî tekoşîn û berxwedana gel wê hêzên dagirker negihêjin armanca xwe. Dema bi van êrişan negihîşt armancên xwe êdî dest bi ziraviyê şerê taybet di nava ciwanan de kiriye. Teşwîq kirina ciwanan ji bo derketina ji welat û durketina ji xeta welatparêziyê, di heman demê de bikaranîna ciwanan bi riya pere û xapandinê di aliyê sîxurtiyê de. Ya girîng jî belavkirina madeyên hişbir di nava ciwanan de, ev hemû weke hedefgirtina hêza ciwanan di aliyê ruhî û fîzîkî de ye. Em jî li hember van êrişan xwe berpirisyar dibînin û şiyarkirina civakê erka me ye".

**"Divê ciwan li dijî planên şerê taybet her tim li ser pyabin "**

Emîne xuya anê ziman ku armanca wan ji vê pêngavê hişyarkirina ciwanan û girîngiya erk û misyona wan di pêvajoyê de û wiha domand: "Armanca me ya sereke ew e, ku ciwan û jinên ciwan ziraviya siyaseta ku li ser wan tê meşandin nasbikin û planên heyî pûçbikin. Ji ber ku ciwan hêza dînamîka civakê ne û ji bona vê yekê pêwîste ku erkên ku dikevin ser milê wan nasbikin û li gorî wê tevbigerin ji hemû milî ve pêşengtiya civakê bikin.

Herwiha Emîne bal kişand ku ciwan hêzeke pêşeng temsîl dikin û wiha got: "Yên ku li hember pêvajoyê bibin xwedî bersîv û derbeyên giran li dijmin bidin ciwan in. ciwanên bi rêxistinkirî yên xwedî armanc wê bikaribin pêşengtiyê di hemû aliyan de bikin. Rol û misyona ciwanan di vê demê de giran e, divê bi zanebûna rastiya dijmin û polîtîkeyên tên meşandin tevbigerin û bibin hêza yekemîn a valaderxistina hemû êriş û pilanên ku li ser gel û civakê têne rêsandin".